**K.T.**

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ**

**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**


**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

# EFSANEYÊN LI HERÊMA HEZEXÊ (GUNDÊ BABEK-RÎZOK-HEDIL-BASIBRÎNÊ)


**Xwendekar**

Hakim BAĞI

22721136

**Şêwirmend**

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI



**Mêrdîn 2024**

**K.T.**

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ**

**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

# EFSANEYÊN LI HERÊMA HEZEXÊ (GUNDÊ BABEK-RÎZOK-HEDIL-BASIBRÎNÊ)

**Xwendekar**

Hakim BAĞI

22721136

**Şêwirmend**

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

**Mêrdîn 2024**

**T.C.**

**MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ**

**TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

# PROJE ONAYI

Enstitümüzün Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 22721136 numaralı öğrencisi Hakim BAĞI'nın hazırladığı "**Efsaneyên li Herêma Hezexê (Gundê Babek-Rîzok-Hedil-Basibrînê)**" başlıklı BİTİRME PROJESİ ile ilgili SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 02.02.2024 tarihinde saat 13:00'da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Danışman………………………………….. (İmza)

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Üye ………………………………............ (İmza)

Dr. Öğr. Üyesi İbrahim TARDUŞ

Üye ………………………………............. (İmza)

Dr. Öğr. Üyesi M. Şirin FİLİZ

....../....../2024

………………………..

Enstitü Müdürü

(Doç. Dr. Ahmet KIRKAN)

# ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında;

□ Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,

□ Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,

□ Tez çalışmasında kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,

□ Tez çalışmasının özgün olduğunu,

□ Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

**İmza**

**Hakim BAĞI**

**02.02.2024**

# KURTE

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

Efsaneyên li Herêma Hezexê (Gundê Babek-Rîzok-Hedil-Basibrînê)

Hakim BAĞI

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtûya Zîmanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Hejmara Rûpelan: 36

Efsane di nav zanista folklorê da yek ji cureyên vegêrana gelêrî ye. Di efsaneyan da bawerî xala mutleq e. Efsane rast nebin jî bi wan wisa tê bawerkirin ku rast in. Îcar derbarê cih, kesayet, bawerî, rabûn û rûniştin û heyînên derasayî da efsane di nav Kurdan da jî hatine gotin. Di vê xebatê da me jî nêzî deh efsaneyên li herêma Hezexê, xisûsen li gundê gundê Babek, Rîzok, Hedil û Basibrînê li gorî rêbaza berhevkarîya keresteyên folklorê ya Kenneth S. Goldstein berhev kirin. Ji bilî berhevkarîya efsaneyan me di vê xebatê da beşekê behsa efsane û pênaseya wê kir û di beşa duyem da jî me qala gundê Babek, Rîzok, Hedil, Basibrîn, Zengilok û Xirabê Sosina kir ji aliyê erdnîgarî, nufûs û aborîyê ve. Di encamê da em gihiştin wê qenaetê ku efsaneyên me berhevkirî bi piranî derbarê cih û kesayetên pîroz da ne. Ev jî nîşanî me dide ku kesayet û cih du diyardeyên pîroz û pêbawer in ji bo Kurdên li herêma Hezexê.

**Bêjeyên Sereke:** Berhevkarî, Efsane, Bawerî, Hezex, Gundê Babek-Rîzok-Hedil-Basibrîn.

# ÖZET

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi
İdil (Hezex) Yöresinde Bulunan Efsaneler (Üçok-Oymak-Haberli ve Kaya Köyü)
Hakim BAĞI
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Sayfa Sayısı: 36

Efsane halk anlatıları arasında yer alan bir halk anlatı türüdür. Efsaneler için inanç unsuru temel unsurlardandır. Efsaneler aslında gerçek bir vakıaya dayanmasalar bile doğru ve gerçekmiş gibi inanılır. Kürtler arasında da yerler, şahsiyetler, gelenek ve görenekler, olağanüstü varlıklar üzerine efsaneler söylenilegelmiştir. Biz de bu çalışmada İdil yöresine ve özellikle de Babek, Rîzok, Hedil ve Basibrîn köylerine ait yalaşık on adet efsane derledik. Bu derlemeyi yaparken Kenneth S. Goldstein'in sahada folklor derleme metodunu esas aldık. Efsane derlemeleri yanısıra çalışmamızın birinci bölümde efsane tanımından bahsederken ikinci bölümünde ise Babek, Rîzok, Hedil, Basibrîn, Zengilok ve Xirabê Sosina köylerinin coğrafik, ekonomik ve demografik özelliklerinden bahsettik. Sonuç olarak bu yörede derlediğimiz efsanelerin çoğunlukla kutsal mekân ve şahsiyetler üzerine anlatılanlar olduğu kanaatine vardık. Bu da bize şahsiyetler ve mekânlar bu yöredeki Kürtler arasında iki kutsal fanomen olarak değerlendirildiğini göstermektedir.

**Anahtar Kelimeler:** Derleme, Efsane, İnanç, İdil, Babek-Rîzok-Hedil-Basibrin Köyleri.

# ABSTRACT

Without Thesis High Licence Finish Project

Legends That are Told in Hezex Region (Villages of Babek-Rîzok-Hedil-Basibrîn)

Hakim BAĞI

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkîye

Kurdish Language and Culture Department

Number of Pages: 36

Legend is a type of folk narrative among folk narratives. The element of belief is a fundamental element for legends. Even if the legends are not based on real facts, they are believed as if they were true and real. Among Kurds, legends have been told about places, personalities, traditions and customs, and extraordinary beings. In this study, we have compiled about ten legends from the Idil region, and in particular from the villages of Babek, Rîzok, Hedil and Basibrîn. In doing so, we relied on Kenneth S. Goldstein's method of collecting folklore in the field. In addition to collecting legends, in the first part of our study, we talked about the definition of legends, and in the second part, we talked about the geographical, economic and demographic characteristics of the villages of Babek, Rîzok, Hedil, Basibrîn, Zengilok and Xirabê Sosina. As a result, we came to the conclusion that the legends we compiled in this region are mostly about sacred places and personalities. This shows us that personalities and places are considered as two sacred phantoms among the Kurds in this region.

**Keywords:** Compilation, Legend, Belief, Idil, Babek-Rîzok-Hedil-Basibrin Villages.

# PÊŞGOTIN

Hemû milletên xwedî vegêran û edebîyat di dawîya sedsala nozdehemîn da vegêran û edebîyata xwe ya gelêrî xistine bin qeydê û berhevkarîyên gelek berfireh li ser pêk anîne. Kurdan jî di serê sedsala 20an da dest bi vî karî kiriye. Lê mixabin ji ber parçekirina coxrafiyaya wan û herwiha sedemên weku şer û qirkirinan xebatên wan ên di vî warî da yan lawaz bûne yan rawestiyane yan jî parçe parçe mane. Xisûsen di serê sedsala 21an da li Bakurê Kurdistanê hewildanên di vî warî da careke din geşe da û heya niha gelek xebat pêk hatine. Lê dîsa jî gelek kêmasîyên berhevkarîyê û xebatên teorîk hene.

Me jî di vê xebatê da xwest ku di warê efsaneyan da berhevkarîyekê li herêma Hezexê û xisûsen jî li gundên weku Babek, Rîzok, Hedil û Basibrînê bikin. Çimkî heya niha berhevkarîya herî kêm di warê efsaneyan da çêbûye û bi rêberî û rênîşandana şêwrimendê xwe min jî xebata xwe di vî warî da kir. Me tev da 11 efsane berhev û tomar kirin. Efsaneyên me berhevkirî bi piranî li ser cih û kesayetên pîroz bûn. Ji bilî efsaneyan me berhevkarîyeke din derbarê erdnîgarî, aborî û demografîya gundên Babek, Rîzok, Hedil, Basibrîn, Zengilok û Xirabê Sosina da kir. Çimkî ev gund qada berhevkarîya me bûn.

Bêguman amadekirina vê xebatê tene bi xîret û xebata min pêk nehat. Xisûsen di berhevkarîya daneyan da malbata min û xizm û nasên derdor gelek alîkarîya min kir ku ez minetdarê wan im. Herwiha di danîna çarçoveyê, rêbazê û ji aliyê fikira xebatê ve alîkarîya şêwirmendê min nayê paşguhkirin. Loma ez spasîyeke ji dil û can ji şêwrmendê xwe mamosta Doç. Dr. Kenan SUBAŞI ra dikim.

**Hakim BAĞI**

**Mêrdîn**

## NAVEROK

**KURTE** ........................................................................................................ I

**ÖZET** ........................................................................................................ II

**ABSTRACT** ........................................................................................................ III

**PÊŞGOTIN** ........................................................................................................ IV

**KURTEBÊJE** ........................................................................................................ VII

**DESTPÊK** ........................................................................................................ 1

**BEŞA YEKEM**

**EFSANE**

1.1. Pênaseya Efsaneyê ........................................................................................................ 2

**BEŞA DUYEM**

**DANASÎNA HERÊMA HEZEXÊ (GUNDÊ BABEK-RÎZOK-HEDIL-BASIBRÎN-ZENGILOK-XIRABÊ SOSINA)**

2.1. Babek ........................................................................................................ 5

2.2. Rîzok ........................................................................................................ 5

2.3. Hedil ........................................................................................................ 6

2.4. Basibrîn ........................................................................................................ 8

2.5. Zengilok ........................................................................................................ 9

2.6. Xirabê Sosina ........................................................................................................ 10

**BEŞA SÊYEM**

**EFSANEYÊN LI HERÊMA HEZEXÊ (GUNDÊ BABEK-RÎZOK-HEDIL-BASIBRÎN)**

3.1. Efsaneya Girê Êlim ........................................................................................................ 12

3.2. Efsaneya Darên Digirî ........................................................................................................ 13

3.3. Efsaneya Girnewas ........................................................................................................ 15

3.4. Efsaneya Şêx Qasim li Newala Dikê ku Girêdayî Sirta Elîka ........................................................................................................ 15

3.5. Efsaneya li ser Nebî Nûh ........................................................................................................ 16

3.6. Efsaneya Deviya Fadil û Şûşan ........................................................................................................ 18

3.7. Efsaneya Dêra Mor Basûs ........................................................................................................ 20

3.8. Efsaneya Feqiyê Teyran û Tûma ........................................................................................................ 22

3.9. Efsaneya Devgirêdana Gûran....29
3.10. Efsaneya Mor Dodo....30

**ENCAM....33**

**ÇAVKANÎ....34**

# KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| **Bz.** | Berîyê Zayînê |
| **Hwd**. | Her wekî din |
| **r.** | Rûpel |

# DESTPÊK

Efsane di nav zanista folklorê da yek ji cureyên vegêrana gelêrî ye. Di efsaneyan da bawerî xala mutleq e. Efsane rast nebin jî bi wan wisa tê bawerkirin ku rast in. Îcar derbarê cih, kesayet, bawerî, rabûn û rûniştin û heyînên derasayî da efsane di nav Kurdan da jî hatine gotin. Têkiliya efsaneyê bi vegêranên gelêrî yên din ra jî xurt e. Wisa tê zanîn efsane ji mîtan nizilîne ango cureyê herî zede nêzîkî mîtan e. Çimkî efsane jî li ser çêbûna cihan û heyînan tê gotin. Herwiha unsûrên efsaneyî di nav destan û çîrokan da jî xuyaye û kifş e ku ev vegêran di nav danûstandinekê da ne.

Amanca me di vê xebatê da berhevkirina wan efsaneyan e ku li herêma Hezexê û xisûsen yên li gundê Babek, Rîzok, Hedil, Basibrîn, Zengilok û Xirabê Sosina tên vegêran. Çima xisûsen berhevkirina efsaneyan? Çimkî din av xebatên folklora Kurdî da cureyekî ku pir berbelav, lêbelê kêm xebat li ser hatine kirin efsane ne. Heta ji hêla berhevkarîyê ve jî gelek qels maye. Loma me jî xisûsen berhevkarîya nimûneyên vî cureyê ji xwe ra kir amanc.

Rêbaza me ya ku me di vê xebatê da şopand li gorî berhema Kenneth S. Goldstein ya bi navê Rê û Rêbazên Berhevkarîya Keresteyên Folklorîk li Qadê ye. Li gorî vê rêbazê me di serî da hin xwendinên derbarê efsaneyan da kirin, paşê me biryara qada berhevkarîyê da. Ji ber ku dema me kin bû, em wisa fikirîn qada herî maqûl ya nêzî malbat û gundê me be. Çimkî ji aliyê pêbawerîyê ve dê zede mişkîle ji bo me çêebûna û me dê zûtir berhevkariyê bikira. Li ser vê esasê me gundê Babekê ya li ser Hezexê weku navend kifş kir û gundê derdor ên weku Rîzok, Hedil, Basibrîn, Zengilok û Xirabê Sosina jî lê zede kir. Di eslê xwe de gundên ne ji hev dûr in û hin efsaneyên wan jî hevpar in her weku efsaneya Girê Êlim. Bi vî rengî me nêzî 11 efsane ji vê mintiqeyê kom kirin, paşê wan deşifre kir û di beşa sêyem ya vê xebatê da bi cih kir. Me ji bo berhevkarîyê bi vêgêran ra rûbirû axift. Lê carinan vegêrên ku em rûbirû negihiştine wan, me bi rêya telefonê hevpeyvîn kir. Me hin hevpeyvînan kir bin qeydê û hin ji wan jî bêqeyd tenê bi nivîsê tomar kirin.

Sînor û astengîyên ku di vê xebatê da derketin pêş bêtir bi berhevkarîyê ra eleqedar bû. Kifş bû ku êdî weku gelek vegêranên gelêrî efsane jî zêde di bîra gel da nemane û her diçe bêtir tê jibîrkirin.

# BEŞA YEKEM

# EFSANE

## 1.1. Pênaseya Efsaneyê

Efsane di nav zanista folklorê da yek ji cureyên vegêrana gelêrî ye. Di efsaneyan da bawerî xala mutleq e. Efsane rast nebin jî bi wan wisa tê bawerkirin ku rast in (Bascom, 2006: 114, 116-117). Îcar derbarê cih, kesayet, bawerî, rabûn û rûniştin û heyînên derasayî da efsane di nav Kurdan da jî hatine gotin. Têkiliya efsaneyê bi vegêranên gelêrî yên din ra jî xurt e. Wisa tê zanîn efsane ji mîtan nizilîne ango cureyê herî zede nêzîkî mîtan e. Çimkî efsane jî li ser çêbûna cihan û heyînan tê gotin. Herwiha unsûrên efsaneyî di nav destan û çîrokan da jî xuyaye û kifş e ku ev vegêran di nav danûstandinekê da ne (Sakoğlu: 1980: 21-22; Keskin, 2019: 174-177).

Ji bo pêbawerîya efsaneyan hin gotin tên teserrufkirin ku ev wiha ne: “min bi çavên xwe dîtin”, “hate serê min”, “filankesê got”, “ez bixwe bûm şahid” û hwd. Herwiha di wan da endîşe û tirs hene (Buch, 2006: 226).

Li gorî Subaşı (2022: 530-533) peyva efsaneyê di nav kurdan da ji bo vegêranên gelêrî yên weku mît û çîrokê jî hatine gotin û ev bûye sebeba tevliheviyê. Loma li gorî wê heke di nav vegêranên gelêrî da ev xisûsîyetên li jor behskirî hebin, meriv divê wî cureyî weku efsane bi nav bike. Di vî warî da Subaşı (2022: 533) wiha dibêje: “Li gorî me ya herî durist ew e ku em çemka “efsane”yê li beramberî “legend”a Îngilizî bi kar bînin û ew vegêranên ku bi baweriyê re pir peywendîdar bes ji çîrok û mîtan cuda di bin vî sernavî de nîşan bidin.”

Saim Sakaoğlu (1980: 4) jî senifandinên efsaneyan bi me ra parve dike û ji bo efsaneyan di pênaseyeke giştî da dibêje vegêrê efsaneyan tarîxeke muayyen bi hedîse-yeka derasayî ra peywendîdar kirine, efsaneyan şaxsîyeteke muayyen dîsa bi hin xisûsîyetên derasayî ra peywendîdar kirine. Di eslê xwe da ew vegêranên heqîqî ne, tê da ûnsûrên derasayî hene. Lê xelk ji wan bawer dike.

Ji bilî pênaseya efsaneyê gelek senifandinên li ser hene ku yek ji wan ya Juha Pentikainen (2006: 230) e ku bi kurtî weku “efsaneyên gerok” û “efsaneyên mehellî”

dabeş dike. Li gorî wê efsaneyên gerok yên li gelek dever û welatan digerin û hevpar in. Efsaneyên mehellî jî yên ku aîdê gundek an jî herî zêde devereke teng in.

Ji senifandinên efsaneyan ya herî berfireh ew e ku di encama kongreyên xebatên li ser efsaneyan de derketine. Saim Sakaoğlu (vgz. 1980: 15-16) vê senifandinê wiha vediguhêzîne:

1. Efsaneyên li ser afirandin û dawîanîna (qiyamet) dinyayê.
2. Efsaneyên tarîxî û efsaneyên bi tarîxa medenîyetan ra eleqedar in.
    A. Koka Cih û Eşyayên bi Medenîyetan ra Eleqedar
    B. Efsaneyên Derbarê Hin Cihan de
    C. Efsaneyên li ser dema berîtarîxê (prehistorya) û serdemên ewil.
    D. Herb û felaket
    E. Kesayetên di nav Civakê da Derketine Pêş
    F. Têkçûna Pergalekê
3. Hêz û heyînên dersiruştî yan jî yên mîtîk.
    A. Qeder
    B. Mirin û Mirî
    C. Xeyalet û Cihên Neewle
    D. Şer û Merasimên Xeyaletan
    E. Îqameya li Dinyaya Din
    F. Cin, Perî, Ruh
    G. Xeyaletên ku bi Medenîyetan ra Eleqedar
    H. Mexlûqên Veguherî
    İ. Şeytan
    J. Ruhên Xebîs yên Nexweşiyan Çêdikin (Cin û Nexweşiyên Wan)
    K. Kesên Xwedî Xisûsîyetên Dersiruştî

L. Ajel û Nebatên efsanewî/mîtîk

M. Gencîne

4. Efsaneyên dînî (efsaneyên bi Xweda û lehengan ra eleqedar).

# BEŞA DUYEM

# DANASÎNA HERÊMA HEZEXÊ (GUNDÊ BABEK-RÎZOK-HEDIL-BASIBRÎN-ZENGILOK-XIRABÊ SOSINA)

## 2.1. Babek

Babek em nizanin ji kengî ve hatiye avakirin. Lê beriya me Fileh, Xelîlî, Barimî, Seyîdên Tîrûyî û Xirabripinî te de dijîn. Em jî sala 1964 an de miha Nîsanê hatine Babekê. Di Babekê de hingî nezî 60-70 mal hebûn. Em bi xwe ji Rîzokê ne. Em ji eşîra Hesînan e. Ji filehan mala Hiltûş, Şime, Gorgîs te de habûn, Metran Selîba te de dijî. Şime zavayê mala Polos bû. Mala polos û mala Hiltûş mirovên hev bûn. Di Rîzokê de Rîzokiyan li ser pevçûna sa hevdû kûştin. Piştî kû em xwînî bûn em hatine Babekê. em û filihê Babekê mirovên hevbûn. Ji ber wê yekê em ji rîzokê derketin hatine Babekê ji wê rojê ve em li Babekê ne. Ji Rîzokiyan bavikê Xişêka, ji Xirabêripin bavikê Misûrkan, ji Xelîlan mala Mele Xiso, Mehmûdê Sekê, Mecîdê Gûlê, ji Barimiyan mala Tahirê Heskê, Ji seyidan jî Seyid Birahîm tê de dijîn. Îro jî xişêkî û misûrkî têde dijîn. Îro jî nezî 80-100 malî hene. Îro gûndî bi tevahî qorîcî ne. Ji sala 1985 an de gûndî qorîcî ne. Ji ber nakokiyên nava gûnd çend caran bavikan ji gûnd bar kirin. Heger gûndiyan ji ber hev bar nekiriba îro zêdeyê 500 malî hebû (Abdullah Çin, 2024).

## 2.2. Rîzok

Dibêjin yekî bi navê Emer Axa li Iraqê mezinê Eşîra Hesina hebû di nav malbata wan de xwînî çê bû. Hinek dibêjin xwe kuştiye. Emer Axa û pismamê xwe yên kû di benda wî de ji Iraqê bar kirine hatine Rûhayê. Emer Axa, Izêr, Mîrzo û Eshed çar bavik hatine Rûhaye cî girtine. Nizanim çiqasi li wir mane. Pir dewlemend bûn. Keçeke Emer Axa yeke pir xweşik hebû. Axayekî xwert ji herêma Rûhaye dil ketiye keça Emer Axa. Li wir gotiye û qîma xwe aniye kû keça xwe bide. Min navê wî axayê Rûhayî zanî bû lê ji bîra min çûye. Niha naye bîra min. Lê Mîrzo Axa qîma xwe neaniye. Gotiyê heger em keça xwe bidine vî axayê Rûhayê gelên me yên Iraqê wê tenazê xwe bi me bikin wê bêjin keça xwe kirine bertil dane mezinê Rûhayê û em vê bazarê qebûl nakin. Li wir şer kirin. Miletî Rûhayê gelek bûn. Mecbûr man ji wir jî bar kirin çûne

deşta Mûşê. Lê li deşta Mûşê jî serê wa ji belayê xelas nebû. Axayekî mezin ji Mûşê jî dil kete keça Emer Axa de. Li wir jî li ser keça Emer Axa şer derket gelekî hevdû kuştin. Û birayê wa Izêr jî li wir hate kuştin. Ji wir bar kirin dîsa berê xwe dane Iraqê. Hawara wa gihişte pismamê wa yê Iraqê Eşîra wa hatine bi wan ve û şer di navbera Eşîrê Mûşê û Eşîra Hesinan de pir dewam kiriye şer kirine ji Mûşê heta gihiştine Iraqê Herêma Hesina. Keça xwe nedane Mûşiya.

Piştre demeke dirêj de levhatin çê kirine lê fitna nav kurmanca tu caran xilas nabê û dîsa ji bavikekî Eşîra Hesina sê bira hatine Selekûnê. Navê yekî ji wa Hacî bû ew ji Selekûnê hatiye Rîzokê û li wir zêde bûne. Birayê wa yê li Selekûnê mayî navê wî Ezdîn bû. Yê din jî navê wî ez nizanim lê jêre Mela dibêjin. Mela bû. Ew jî çûye Gûndê Eyserê.

Hacî li Rîzokê di kurê wî çê bûne navê yekî Evdalê ew pêşiyê me ye, yê din jî Osman e ew pêşiyê bavikê Osmanka ye. Em sala 1963 dan ji Gûndê Rîzokê hatine Babekê. Me jî li ser pevçûna şivana ku li çolê li hev xistibûn me hevdû kuşt ji ber wê yekê em ji wir hatine babekê. Îro zêdeyî sed malî li Rîzokê hene. Debara wa li ser cotkarî û xwedî kirine pêze. Îro jî tirê wan hene. Karê nakliyatê dikin. Diçine Iraqê. Gelek malên wa çûne Elmanya jî. Hinek li Gûndê Qesrokê, hinek jî hatine Hezexê. Panzdeh sala belediya Hezexê di destê Rîzokiyan de bû. Navê Mezinê Belediyê Hacî Abûzêd bû. Mirovê kî qama wî zedayî du metra dirêj bû. Xirêza wî ne baş bûn. Eware derketin. Îro birayê wî di siyasetê de aktîfin. Careke din jî belediye ketiye destê Hesinan de. Mirado Babekî bû wî jî pênc sala Mezinatiya Belediya Hezexê kiriye. (Abdulkerim Bağı, Babek, 03/02/2024)[1]

### 2.3. Hedil

Beriya kû em werine Hedilê gelê Sûryaniye di Hedilê de hebûn. Piştî wan re ji Gûndê Gizirê Mala Simoyê Mejdo hatine ketine Hedîlê de. Piştî Sûryaniyan re wa gûnd avakiriye. Ji xwe li wir Dêra Beranî hebû. Du dêr li Hedil'ê hebûn. Hên jî ew dêr ava ne. Ciyê pir muqeddes li derdora Gûndê Hedîlê û nava gûnd bixwe jî hene. Li hawîrdorê gûnd bîr û kanî hene. Îro jî ew kanî hene û di herîkin. Navê bîrekî ji wan

[1] Ev agahi Bavê min Abdulkerîm Bağı bi telefonê ji min re got. Min nikarî ez dengê wî bigirim.

bîra Bava ye li aliyê Xaltan, Xendûk û Basaqê de ye, lê di aqarê Hedîlê de ye. Kaniya Moziyê heye li hemberê Basaqê û Midihê li aliyê Gûnd ê Başûr û Rojavayê gûndin. Her çar aliyê gûnd newalin. Aliyê zaxûran hinekî nêzî kîlometrekê tenê ne newala, wekî din her çar alî newalin. Newalê gûnd berê di herikin û sê aş li ber hebûn. Aşê mala Têhir, Mala Haco û Mala Hesen bûn.  Zedayî 70-80 malê Hediliyan di Hedilê de hebûn hemî jî Zaroyên Simo bûn. Mejdîn, Ehmed û Mihema sê birayê hevbûn zaroyên Simo bûn. Ev her sê bavên Hediliyan ne. Bavikekî Pismamê wa hebû xwe li wa girti bû. Bi wan re dibine çar bavik. Em ji mala Mejdînin. Piştî Mejdîn re jî Tahir tê. Gelek Zaroyên mejdîn hebûn. Çar jinê wî bûn. Her yekê çar pênç kûrê wa hebûn. Yê yekê Tahir, Misto û Simaîlk bûn. Mezûl, Elî, Evdo û Emîn jî yê yekê bûn. Hesen û Mûsa û Hisên zaroyên Ehmedin ew birayê Mejdine.  Jineke Mejdîne din jî zaroyên wê Abûzêd, Xalit û Xelîl Hene. çendeke din hene ez hemiya nizanim.  Yê Mihama jî Selîm, Salih û Mecît hebûn. Keç jî gelekin lê ez keça nizanim.

Miletê Hedilê debara wa li ser aş û çandiniya birinc dibû. Li bar avê ji bilî birinc bacan, pîvaz, bîber û cûreyên şînî tevahî diçandin.  Kuncî ji di çandin. Alikekî gund rez bûn. Hejîr, behîv û daren din hebûn. Aliyê din jî Genim, Nîsk, Ce, Nok di hate çandin. Werz jî diçandin.

Sewal û Dewar jî xwey dikirin. Gûndî debara wa bi cotatiya dibû.

Her çar aliyê gûnd şikeft hebûn û pazê wan di şikefta de dima. Her bavikekî şikeftê wan cûda bûn.

Beriya hingî çend cara gûnd hatiye şewitandin. Cara dawî jî di 94 an da ji ber pirsgirêkê polîtîk hate xirakirin îro hindik mal li wir hene.

Piştî 2005 an de nezî bist malan carek din vegeriyane gûnd îro li gûnd jiyana xwe berdewam dikin.

Gelek malê Hedîle çûne Hezex, Nisêbîn, Mîdyat, Entab, Mersîn û Stenbole û li her deverî belav bûne. Pirê wan li Elmanya dijîn. Li gelek deverê Ewrûpa hene lê bêhtirê wan li Elmanya ne. (Galip Aslan, Zîgen/Almanya, 03/02/2024)

## 2.4. Basibrîn

Ev gûnd beriya miladê ava bûye. Berîya Zayina Nebî Îsa ev gûn mecûsî bûn, Agir û Rojê di hebandin. Baweriya wan bi Rojê bû. Îbadethaneyên wan yê kevn li gûnd hene, di wan de Wêneyên Stêrk û Rojê hene. Piştî Mîladê nêzî 200 salî Xrîstiyanî li vir jî dest pê kiriye gelê vir ji berê de jî Xrîstiyane. Heta nezîkî 1000 an jî bi vî awayî dewam kiriye. 1000 an de 100 malê Misilmanan qebûl kirine bi 200 malê Sûryanî re jiyana xwe berdewam kirine. Bi hev re dijîn. Her tişt li hev belav dikirin. 1100 an de pirsgirêk çê bûn. Hatiye qeyd kirin ku mirovek ji misilmanan dest avetiye keça mezinê Basibrînê. Piştre runiştine bi hevre axivîne. Gotine li ser vê mijarê heye ku em hev bikujin divê em çareseriyekê çê bikin. Hê xirabtir nebûyî em pirsgirêka xwe çareser bikin. Divê Yan em yan jî hun ji gund derbikevin. Xrîstiyan 200 mal bûn misilman jî 100 mal bûn. Misilmanan gotine 12 kg zêr bidine me emê ji gûnd der kevin. Gûndiyan jî 11 kg zêr di nav xwe de dane hev û 1 kg jî ji Mor Gabriyelê deyn kirine dane misilmanan. Ew jî li başûrê Basibrînê girek heye navê wî girî Girê Misilmana ye ketine wir de. heft salan têde mane. Nav navan êrîşî Gûndê Basibrînê kirine. Lê biser neketine. Li wî girî jiyan pir xeter bûye ji ber wê yekê çûne Sûrî. Çûne bajarê Şamê li wir meheleka wanî pir mezin heye. Ji alî herkesî ve tê zanin kû ew malbat misilmanên vî cihîne çûne li wir dimînin. Ew ji Eşîra Salihan e. 6-7 gûndên wan hene. Me jî ji wê Eşîrê di hesibînin.

Piştî fermana 1915 an de zêdeyî 400 mêrê bi çek li gûnd hebûn hemî jî hatin qetilkirin hinek malên pir hindik ji aliyê hinek malên misilmanan ve hatine himaye kirin ew jî ji ber berjewendiyên xwe himaye kirine. Ji ber gunerên wan û zanînen wan ve hatine hîmaye kirin. Û ji ber keçên wan da kû ji xwe re bikine jin ew hîmaye kirine. Ji ber vê yekê hên jî misilman dibêjine me Xalo.

Piştî 1926 an de carek din ew malê kû ji fermanê xelas bûn vegeriyane gûnd. Gelek gelek 10 mal hebûn yên vegeriyan. Ji wê rojê û vir de ew mal li gûnd dijîn. Piştî sala 1980 an de gelek mal çûne Ewrûpa. Nêzîkî 100 malî çûne Ewrûpa. Hên jî yên diçine Ewrûpa hene. Bi piranî çûne Elmanya û Îswîçre.

Îro li gûnd nêzîkî 20 malî hene.

Gûndî niha debara xwe bi xwedî kirina heywanan û rezan dikin. Xort jî di karê înşaatan de dixwebitin.

Cîranê gûndê me Ereban, Bezikir, Daskan, Soran hene. Li başûr gûndê Êzidîya Kîwex heye. Li aliyên din Sarê heye.

Di gûnd de bî sedan bîr hene. Gûndê cîranên me têne gûndê me ji ber avê. Li gûndê me qet av ne bûye pirsgirêk.

Li gûnd 25 dêr, menastirek û xanek heye. (İshak Atak, Basibrîn, 03/02/2024)

### 2.5. Zengilok

Îro di Gûndê Zengilokê de Eşîra Elîkiya heye. Elîkî ji Doxubeyazitê hatine. Bavikê wa yê ewil navê wî Elî Reşke. Ji mirêka ne. Ji malbata xwe xeyidiye. Hatiye gûndê Bakwan ji kesekî re ne gotiye ez xeyîdî me û ne gotiye ez ji mirêke ma. Gotiye ez yekî feqîrim ez ji xwe re li kar digerim. Li wir maye şivantî kiriye. Em ni zanin çiqasî li wir maye. Malbata wî pê hesaye hatine pey ku vegerê lê ew ne vegeraye. Piştre birayê wî Behdir jî hatiye bal wî. Li wir zêde bûne û hatine gûndê Zengilok ava kirine. Weke kû em zanin wa Zengilok ava kiriye. Ev bûyer berî 300 400 salî çê bûye. Çar pênc bavik ji xirêza Elî hatine zangilokê. Navê wan bavika Mala Kirho, Mala Abo, Mala Mûso, Mala Emer, Malî Hacî Ezedîn, Mala Sefer û gelek bavikê din hene kû ez navê wa nizaim. Zêdeyî bîst bavikan li zengilok hene. Nîvê Zengilok Behdirkî ne nîvî Emerkî ne. Em jî ji mala Bêhidirin.

Wexta ez li gûnd miletê Zengilok debara xwe bi xweykirine pêz û cotkarî ye di kirin. Îro jî heywanê wan hene. Û diçine Stenbolê atolya ji xwe vedikin. Tir û Qemyone wa hene û karê nakliyatê jî dikin.

Îro gelek malê Zengilokiya li her deverê herêmê belav bûne. Hinek hatine Nisêbîne, hinek çûne Hezexê, Hinek Çûne Stenbolê û hinek Çûne Elmanya pir belav bûne.

Eşîra Elîka pir mezin e. Li her deverê Tirkî, Irax, Surî û heta bi Îranê hene. Li bajarê Ûrmiye jî pir in. (Zeynep Göktaş, Nisêbîn, 03/02/2024)

## 2.6. Xirabê Sosina

Mehmet Emîn Kavak: Berî go em werin Xirabê sosina em ewwilkî di Sinceberan de bûn. Di şikeftên Delavê Qesrê de bûn. Şikeftê Sinceberanê li Delavê Qesrê. Ew şikeftê hêjî li wir tije ne. Li ser rêya ku diçe Gûndê Erebanê di ber devê deriyê wê re diçe. Em ji wir hatina. Berî ku em werin Şikayeta Erfo çê bû. Di zemanê Osmaniyan de. Tişketî din jî heye lê di vir de nayê gotin. Di zemanê Osmaniyan de Şikayeta Erfo bû. Gilihê wî kirin. Birine Eznawirê dane qazoxê. Eznawir gûndê Nisêbînê ye, bin Xirabşemdînan re ye. Navê wî gundî Eznawira. Sê kurê Erfo hene, dema Erfo hate qazoxkirin her sê kurê Erfo bazdane çûne Surî. Qazox tişketî çawa bû? Qazox hesinekî di nava sandalî de bû, li ser di rûnandin, pê li dugmê dikirin, hêsinekî tûj di nava wî re heta di nav milê wîr re der diket. Bi vî şiklî di hatine Îdam kirin. Vêce wextê erfo qazox kirin danine ser qazoxê qomutanî wî, bê heke yûzbaşî bû, heke bîmbaşî bû, eskerê Osmanî bû, qûmandan gotiyê de go “Erfat” wêxtê qazox giha kezeba wî madê wî qûlibî. Go “Erfat axa ma çi vê zehmettir heye?” go “wellehî tiştekî dî ji vê zehmettir heye” go “çiye”

Go “yekî weke te were mala miho, tiştek nebe miho li ber deynê, jin li mêr meyzêne, mer li jinê meyzêne, ji vê zehmettire”

Go “Erfat axa deynin zilamekî nestêlihe”

Giha kezeba wî. Erfo mir. Zarokê wî bazdan çûne Etmînê. Etmîn gûndekî Hemîkaye. Çûne Etmînê.

“Etmîn di keve kû alî de?”

“Etmîn dikeve nava Sûrî de, li ber Alaqamşê ye”

Çar sala li wir mane. Sala pênca bilitik bûne zaroyên wî. Hersêk ji wir hatine li vir Xirabê sosina avakirin. Hew karîbûn herîne şikeftan. Li wir şikayetê wan di bûn. Her sê bira pevre hatina Xirabê Sosina. Yek ji wa bêdûndan çû. (yanî zarok jê re çê nebûne) û yê din du zaro hebûn. Mihemed û Inis. Inis çû Xirabê Darik, Ev Mala Mer’ik û malak çûye Sûrî di bê Mala Safo, Mala Safo û Mala Mer’ik zarokên Inisin. Mala Safo li Sûrî ne, Simayîl û Nurî kuştin. Yê Mala Hesê bûn. Her dû jî axa bûn. Simayîl û Nurî kuştin. Bazdan çûne Sûrî. Mala Mer’ik hê wê tede ne. Gûndê wa ye. Wa jî

barkir niha çûne Nisêbînê. Gûnd dane zireetê. Gûnd dane zireetçiya xelk ji xwere diçêne. Du sê mal li wir hene. Zarokên Inis jî hatine Xirabê Sosina. Vêce Xirabê Sosina jî Mihemed têde ma. Sê kurê Mihemed çê bûn. Ferho, Elî û Hiseyn. Malal Ferho jî çûne Sûrî. Mala Bavê Newafo û wana. Ew jî hê wê li Sûrî ne. Ew jî çûne Sûrî. Mane Zaroyên Elî û Hisên. Piştî zaroyên Elî û Hisên emê bêjine yê xwe piştî Elî Emer çê bû. Piştî Emer bavê min û her sê birayê xwe çê bûne. Piştî wa ez û tu (Ata Akin) çê bûne. Erfo ma li wir. Mihemed gûnd ava kiri. Mihemed, Hisên, Emer, Tahir û Ez. Ez bavê Pênca me. Û me ev gund ava kir.

Ata Akın: Ew mesela Eşîra Hemika, ji Rimiyê, Rimê Batmanê Eşîrata Raman ya Batmanê ew ji kuderê hatine çawa çê dibê?

Mehmet Emîn Kavak: Di wê tarîxa beriya Erfo de Abbas Hebû. Em yê Ebês in. Ebbas ji Rima hat. Ev Eşîra Rima li Şikefte Pira li qarşê Batmanê ye. Em ji Şikefte Pira hatine li qarşê Batmanê ye. A niha hê ji li wêdê Eşîra Rima hene. Ji wan re dibêjin Rimî. Beriya bi sê salan Osman kûrê yekî ji wanakê axa bû beledî reîse wir bû. Vêce em jî yê Ebêsin em ji nav Rima hatine.  Behrîmka hene ew jî Zengan hatine ew jî baveke di Delavê Qesrê ne. Qeraşka hene ji Hacî Kesan ji Kereşa hatine vêce em hemû ne yekin Xirab Mişkî û Til Dîbî ji Basiqil hatine jê re dibêjin Emir Sama. Basiqil jî gûndê Erebiya ne niha Baxliyê Dargiçê ne. Baxliyê Kerboranê ne. Behrîmka ji Zengan hatine. Em jî ji Batmanê Hatine. Hecî Kesanî û Zewikî Qeraştî ne ji Kereşa Hatine, Kereşa ji ser Cizîrê re ye. Ji çêm û wirde ye.  Îro li Xirabê Sosina mesela ku em li gorî niha em bêjin Bavikê Emera, Mûsa, Hamo, Serhan û Birahîm hene.  Ev her çar pêncek birayên hevin. Emer kûramê wa ye. Bavê meye, Ferho jî kûramê wa ye ew li Sûriye.

Debara Xirabê Sosina weke van gûndên herêmê bi tevahî li çandinî û xwedîkirina heywanan ye. Gûndî nîsk, nok, genim, ce, garis, rez û werzan diçînin. Darên fêkî jî hene. Ji heywanan jî mî, bizin, qaz, elok, çêlak hene. Ji bona bar jî ker û hesp têne xwedî kirin. Li gûn sê çar hezar pez û du sed sê sed dewar heye. Her cureyê dexlê lê tê çandin. (Mehmet Emîn Kavak, Gûndê Xirabê Sosina, 02/02/2024)[2]

[2] Ev pirsên derbarê Xirabê Sosina da Ata Akın di sala 2024an da ji Mehmet Emîn Kavak pirs kirin.

# BEŞA SÊYEM

# EFSANEYÊN LI HERÊMA HEZEXÊ (GUNDÊ BABEK-RÎZOK-HEDIL-BASIBRÎN)

## 3.1. Efsaneya Girê Êlim

Li gor herêma hezexê dibêjin Girê Êlim beramberê çiyayê Cudî û çiyayê Gabarê ye. Hinek dibêjin Girê Êlim, Cûdî û Gabar birayê hev in. Girê Êlim gotiye bavê xwe te ez avêtim ciyekî germ û nexweş û te Cûdî û Gabar avetine zozana ciyê hînik û xweş. Girê Êlim dile xwe bi xwe şewitandiye. Çi dema zivistan te pêşî berf diavêje sere çiyayê Cûdî. Wê deme bavên wa gotiye dile xwe bi xwe neşewitîne çi dema kû germ çêbibe ezê ewrekî bo te şiyênim. Her demên havîna her tim ewr li serê Girê Êlim heye.

Li gor efsaneyeke din jî ji Cehennemê Marek filitiye û hatiye ser rûyê erdê û li vê herêma Hezexê mirov û heywan tev xwarine, xwedê emrî melaîketa kiriye û çûne mar bi zîncîrên zîv û zêr girêdane û hildane ezmana li nîvê rêde zincîr qetiyaye mar jî li erdê ketiye û biketina xwe re vereşiyaye ew vereşîya mêr mîna egir ew dever şewitandiye û hita roja qiyametê jî qet geya û şînayî lê şîn nabe. Piştre melaîket careke din hatine bi dîsa bi zincîrên zêr û zîv û stûrtir girêdane û careke din hildanê ezmana. Vê carê ne qetiyaye. Ji bêr vê yekê gelên herêmê dema diçine serê gir û zêwan dikin hên jî qetê zêran an zîvan dibînin. Ji ber kû ji mêr xelas bûne heta îro jî gelên herêmê zêwan û penayiran hersal dikin û wê rojê tênin bîra xwe.

Girê Êlim li herêma Hezexê di nîvê deşta Êşira Hesinan de ye. Her sal di panzdehê Êlûnê de zêwa Girê Êlim çê dibe. Hefteyekê zêw çêdikirin gelek mirov dihatin û pir sewal û dewar serjêdikirin. Di van zêwan de hesp dibezandin, bi gemş di leyistin, dawet çêdikirin, direqisîn û govend digirtin. Gava dibû êvar agir pêdixistin û heta derengî şevê hinekan zikir dikirin, hinekan li erbanê dixistin, hinekan stran digotin. Yên xort kêçan û kûran yên hevdû diecibandin piştre hevdû dixwestin. Hinek ji wan dizewicîn. Yên diman azûl salên din dîsa dihatin zêwa Êlim.

Li gor baweriyekê ji ber marê Girê Êlim heta îro jî kesek marên reş li wir nakuje. Dibêjin ev çêlikên wî marî ne û gûnihe mirov bikuje.

Abdulkerim Bağı, Babek, 28/01/2024

Cih: Rîzok/Hezex. Ji dayikbûn: 01.01.1947

| | |
|---|---|
| <br>**Wêne 1.** Girê Êlim ji Arşîva Mecit Çevrim | <br>**Wêne 2.** Wêne ji Serê Girê Êlim |

### 3.2. Efsaneya Darên Digirî

Li gor gelên herêmê li bajarê Efrînê mezinekê wê herêmê bi navê Hadî hebûya. Îbrahîm Paşa gelek xerc û bêş ji gelên herêman dixwestin. Hadî gotiye ev Xerc û bêş miletên me diêşînin û em ji îro û pêde xerc û bêşan nema bidin. Îbrahîm Paşa çend qasid şiyandine ji Hadî re û dîse jî dana xerc û bêşa ne pejirandiye. Piştî wê buyerê re Îbrahîm Paşa fermana kuştina Hadî daye. Û gelek leşker hatine ser Hadî û bi wî re şer kirine. Şer gelekî berdewan kiriye, bihezaran leşker hatine kuştin bi sedan gund û bejar ji aliyê leşkerê Îbrahîm Paşa ve hatina şewitandin mal û milkên gelê herêmê hatine talankirin. Gelekî li berhev xistine. Hadî alîkarî ji mezinên eşîrên herêmê xwestiye lê tu kesî alîkarî nedaye Hadî. Bi mehan şer dewam kiriye û şer gihiştiye deşta hesina Hadî alîkarî ji mezinê hesina Elo Mehmeda jî xwestiye. Elo Mehmeda alîkarî pejirandiye û wî jî leşkerên xwe lihev dane hev û çûye alîkariya Hadî. Lê dîsa zora leşkerên Îbrahîm Paşa nebirine. li hemberê Girê Êlim du girên din hene mina hevin weke cêwîbin. Û şer gihiştiye serê van giran. Gelekî şer li ser van giran jî dewam kiriye û dora leşkerên Hadî û Elo Mehmeda dorpêç kirine. Tev leşkerên Hadî û Elo Mehmeda li vir hatine kuştin. Piştî şer xilas bûye laşê hadî birine Efrîne û li wir bûye dareke berûwa û leşkerên wî jî li wir bûne darên berûwan. Elo Mehmeda û leşkerên xwe jî li

van girên pêşiya girê êlim bûne darên berûya nêzî hezar leşkerî hatine kuştin û nezî hezar darî li wir çê bûne.

Ev dever li gor herêmê gelekî muqaddese. Kesek nikarê van daran bibire. Gelên herêmê dibêjin demekê hinek mirovên bi çek hatine û xwestine van daran bibirin lê dema kû bivir li daran xistine xwîn ji darên berûwan herikiye. Wan kesan jî dev ji birîna daran berdane. Hineke din jî hatine ku daran bibirin evarî kon vedane bi şevê leşkerekî li hespekî boz û bi cilên sipî û rima wî jî agir jê diçû ketiya nav wan konan de gelek ji wan mirovan birîndar kirine û ew jî tirsane hew hatine birîna van daran. Demeke nêz de pîrekeke Rîzokî çûye li nav darên digirê piştiyek direh çinîne birine bal gund. Bablîsokek rabûye ew piştî û pîrek bihevre careke din birine devara ku direh jê çinîn. Pirek pir tirsiyaye îde qet kesek neçûye tiştek ji nav Darên Digire ne birîne û ne çinîne.

Gora Elo Mehmeda li gor gelên herêmê pir mûqeddese û gelên herêmê yên kû zarok ji wan re çênabin diçin li ser ziyareta Elo Mehmeda qûrbanekê digurênin û zarok ji wan re çêdibin. Yên kû bawî dibin diçin ser vê ziyaretê dûa dikin nexweşiyên wan diçin. Dema diçine ser vê ziyaretê tewî tewî dikevine hicirkê de. Li wir xwarina xwe dixin dûa dikin û radizin. Gelek mirov zû dixew ve diçin. Yên kû li wir radizin hemî di xewna xwe da dangê asêkirina deriyekî hes dikin. Di xewna xweda hemî jî siwarên li ser hespan bi rim dibînin. Rimên wan gelek dirêjin.

Gelên herêmê dema li vir erdê dikolin serê riman, tîran û qetên şûr û mertalan dibînin. Gelek tirb jî li ser Darên Digirê derdikevin.  Gelek mirov xewnên xwe hên tam ne raketin bi nîvxewî dibînin. Gelek mirovên bawî ku nikarin bimeşin li ser piştan dewaran û hespan dibine ser darên digirê û dema li wir di hicirkê de radizin û van xewnan dibînin sax dibin û bimeşê divegerina mala xwe. Gelek mucîzeyên wisa hatine dîtin. Yên kû tiştên wan winda dibin sê caran hewar dikine Seyid Elo Mehmeda û tiştên xwe dibînin.

Tê gotin ku li Efrînê jî ciyekî mîna Darê Digirê heye ji vê derê re dibêjin darên Hadî. Ew jî mîna Elo Mehmeda ciyekî muqeddes e û gel ji ber mirazên xwe diçine ser wê deverê jî. (Abdulkerîm Bağı, Babek, 28/01/2024).

### 3.3. Efsaneya Girnewas

*Xaleta Zeynep Göktaş ji dayikbûna wê 04.04.1967 ji gûndê Zengilok ku girêdayî Hezexê efsaneya ku li ser Girnewas tê gotin ji min re got.*

Girnewas li bakûrê Nisêbinê girêdayê gûndê Bawernêye. Girekî bilind û mezine. Ji herêma Nisêbîne heta bi Cizîr, Silopî, Merdîn, Qoser, Midyat, Rûha û Amedê mirov têne ser û mirazê xwe di xwazin bi cî bikin. Yên kû nexweş an yên kû dixwazin ji tengasiyan derbikevin an jî yên dixwazin bibine xwedî zarok têne ser vî girî û xwarin û nanê şilik çêdikin û daxwazên xwe dûa dikin. Roja çarşame  mirov diçine ser vî girî û li vir dirazin yên ku dûayê wan zû qebûl dibin di xewnên xwe de mîrê cinan dibînin. Tê bawerkirin ku dûayên wan qebûl dibin. Tê gotin ku ji her deverên Tirkî, Surî jî mirov têne ser vîgirî.

Tê gotin ku navê vî meyitê li vê meqberê dimîne mîrê cina Mîr Osmanê. Ciyekî pir kevnareye. Diroka we pir kevne û gelên ku pê baweriya xwe tînin hijmareke pirin.

Tê gotin ku ev der berê ji aliyên cina ve hatiye avakirin. Gelên herêmê û cinan bi hevre danin û standin kirine, tê gotin ku cina cil bêrgên gelên herêmê li xwe kirine û çûne dawetên Bawernê , Nisêbînê, Şanîşê û di dawetên milet de reqisîne. Heta tarîxeke nêz jî xelkê ditîine dengê dawetên wa û dengê civatên wa kirine lê belê piştre winda bûne. Lê tirb hên jî li wire û gel diçin ser bi miraz dibin (Zeynep Göktaş, 29/01/2024).

### 3.4. Efsaneya Şêx Qasim li Newala Dikê ku Girêdayî Sirta Elîka

*Ev efsanê jî ji aliyê Zeynep Goktaş ve hate gotin.*

Şêx Qasimê Bavê Mirada ziyareteke kevne li gûndê dikêye. Tê bawerkirin ku yên zarokên wa çê nabin têne ser vê ziyaretê, ji ber mirazên xwe sewalekê serjêdikin û dûa dikin ku zarokên wan çê bibe. Hinek li ser vê ziyaretê evara înê roja pênçşemê diçin ser vê ziyaretê û hinek deydikan çêdikin û kevir têxine nav deydikan de eger deydikên wan kevir têde pêne hejandin tê bawerkirin ku zarokên wan wê çêbibe.

Dîsa tê gotin ku mirovek ji gûndê dikê ji mala Silê Qaso çûye şingalê bûye mêvanê maleke ezîdî. Zarokên wê malê çê nabin. Mêvan ji mazûlvan pirsa zaroka kiriye gotiye “ka qey zarokên we qet tunene?” ew mala Êzîdî ku du jinên wî hene û

zarokên wî tunene gotiye “na zarokên me çê nabin” wî mêvanî di derheqê Şêx Qasim de agahî ji wê mala Êzîdî re gotiye; “ li gûndê dikê tirbek heye jê re Şêx Qasimê Bavê Mirada tê gotin û yên ku zarokên wa çê nabe bi xêra Şêx Qasim xêrekê bidin zarok ji wan re çê dibin.” Yên êzîdî gotiye “bi xêra mêşayîx vî barê hejîra bide da ku zarokek ji me re çê bibe.” Wî mirovê dikî jî ew diyarê aniye wî û zarokên xwe xwarine. Lê mirovên êzîdî ji ber ku baweriye bi Şêx Qasim aniye xwedê dûa wî qebûl kiriye û du zarokên wî çê bûne.

Dîsa tê gotin ku gelek mûcîceyên wisa çê bûne (Zeynep Göktaş, 09/01/2024).

### 3.5. Efsaneya li ser Nebî Nûh

Di dema Nebî Nuh de mirov gelek ji rê derketine. Nebî Nûh gelekî xebitiye kû gelên xwe bêne ser rêya heq lê qet gelê Nebî Nûh biya wî nekiriye û nehatiye ser rêye heq. Xwedê jî emîr kiriye gotiye Nebî Nûh keşteyeke mezin çê bike ezê tofana miletê te rakim dinya wê tev bimîne dibin avê de yên ku ji te bawer bikin bila li keşteya te siwar bibin yên bawer nekin jî bila herin helakê ji temamên ajalan jî ezê her cûreyekî cotekî bişînim keşteya te. Nûh jî di bêje “Xûdayê min ezê çawa vê keşteya mezin ava bikim?” xwedê gotiye “Ezê ji te re xûlamekî rêkim kû alîkarî bide te” û jê re hûtekî biqasî çiyayekî mezin rê dike. Nebî Nûh jêre dibêje “ya hûto here ji min re ji çiyê gelek daran bibire û bîne.” Hût dibêje “ez gelekî birçî me û heta tû min têr neke ez tiştekî ji te re nayênim.” Ew jî dibêje “ya hûto he re daran ji min re bîne ezê te têr bikim” hût vê xwesteka Nûh qebûl dike û diçe gelek daran dibire û top dike wan bi werisan girê dide. Lê şeytan dikeve şiklê mirovekî de û tê pêşiya hut dibêje "ya hûto tê çi ji van ewqas daran bike?” hût dibêje “ezê van daran bibime ji Nûh re û ew jî wê min têr bike” şeytan dibêje “ya hûto Nûh ji te re derewan dike, ji bilî nanek û qetek nanê wî pê ve tûneye, ma tê çawa ji qetek û nanekî têr bixwe?” hût ji şeytên bawer dike û dibêje madem nûh nikare min têr bike ez jî van daran nabim û werîsê xwe dikişîne û diçe bal Nûh ve. Lê şewkê werîsê wî li daran dialiqe û daran tev li pey xwe dixiriqîne bal Nûh ve. Gava diçe bal Nûh dibêje Nebî Nûh “ tu çima li min vira dike, ji bilî nanek û qetekî te ve tuştekî te tûneye ma ez bi nanek û qetekî têr dixwim?” Nûh di bêjiyê de “ya hûtê xwedê min ji te re ne gotiye çiqas nanê min heye min gotiye ezê te têr bikim. Te li pey xwe dar anine û ezê dîsa te têr bikim. Lê here li ber şetê dîcleyê dest û rûyê xwe bişo

û were ezê te têr bikim.” Hût dîsa înat kir û got “na ez dest û rûyê xwe naşom. Yan ezê destê xwe yan jî rûyê xwe bişom” Nûh fikirê û go “ev hûtê xwedê çiqas bi înate ez çawe bikim, ez bêjim destê xwe bişo rûyê wî wê lewitî bimîne, hema ezê bêjim rûye xwe bişo dema rûyê xwe şuşt wê demê destê wî jî wên bêne şuştin.” Nûh jê re got “ya hûto hema hera rûyê xwe bişo” hût jî çû destekî xwe da aliyekî avê destê din da aliyê din ê avî û sê cara rûyê xwe di nav avê da û hat go “aha min rûyê xwe şuşt deka min têr bike” Nûh jî ew nan û ew qetê nên anî danî ber hût û gotiyê “ deka kerem bike bêje bi ismillahî rehman û rehîm û bixwe” dîsa hût got “ ezê an bêjim bi ismillah an jî ezê bêjim rehman û rehîm.” Nûh gotiyê “ne ji xwe te got deka vêce dest pê bike û bixwe” hût dest bi xwarina nên kir nan xilas kir rahişte qetê nên qetê nên xwar dît kû nan dîsa li ciyê xwe nan xwar dît kû qet li ciyê xwe bereket kete nava nên de kir û nekir ew nan û qetê nen xelas nebûn heta hût têr xwar. Hût alîkarî da Nûh keşte xelas kirin. Nûh gelê xwe careke din dawetî ser rêya heq kir lê tukesekî jê bawer nekir tenê keçeke wî û zavayê wî û pîreka wî û pîrekeke kal û bî ketine keşteyên de. Ji ajalên dinyayê jî her cûreyek cotek kişiyane nava keşteyên de. Nûh gote gelê xwe “ bikevine vê keşteyê de dinwa wê tev bimîne di bin avê de û demeke dirêj jî hun erdê nema dibînin. Ev keşte bi emrê xweda min ava kir û ez we dawetî ser rêya heq dikim. Yên kû bawer bikin kerem bikin siwar bibin yên bawer nakin jî wê biçine helakê” gelê nûh jê bawer nekir û henekê xwe pê kirin “ev çiyayên bilind wê çawa bimînin di bin avê de?” hinek ketine şûphê de yek ji wan jî kûrê wî bû xaniyê xwe gelekî asêkir kû av di tû deran vê nekeve xanî de. Wext hat avê li gûndê Daderê di tenûra wê pireka kal û bî de avê da der. Ji ber vê yekê hên jî navê wî gûndî Gûndê Daderê ye. Ji kêzina tenûrê av herikî herikî û her der bû av bilind bû gelekan xwestin kû bikevine keşteyên de lê derî li ber wan hate girtin.

Her der ma di bin avê de. Kûrê wî yê kû xaniyê xwe asê kiribû demeke dirê nemir lê di nav pîsîyê xwe de ew jî xeniqî û ew jî çû helakê.

Keşteya Nebî Nûh çil rojî ma li ser avê. Piştî çil rojê av hindik hindik vekişiya. Pêşî serê ciyayê Cûdî hate dîtin. (Xaltîka zeynebê digot li gorî devoka gelên cizîr û herêma botan ji bedêla Cûdî “Cîdî” tê gotin. Tê wateya “ew devera hatî dîtin” ) keşteyê xwe kişande serê çîyayê Cûdî ve û li ser Çiyayê Cûdî keşte sekinî. Nûh gote bawermendên xwe “ecelê nekin, bila bi temamê ev vekişe dûv re emê cejnê bikin.” Lê

bawermendên wî xwe negirtin û wê rojê cejn çê kirin û xwarinên di keşteyên de heyî hemî kirin nav hev de û kelandin û xwarin. Lê av zû ne vekişiya û çendekî li serê çiyayê Cûdî şepirze bûn. Piştre av bi temami  vekişiya û bi selametî xwe berdane xwar. Keça nûh stewr bû û zarok jê re çê nedibûn. Lê mûcîzeyek çêbû ew keça wî biheml bû zarok jêre çêbûn.  Li gorî baweriyekê mirovên cîhanê tev xirêza keça Nebî Nûhin. Hên jî tirba Nebî Nûh li Cizîrê ye û her tim mirov ji hemî deverên cîhanê qista ziyareta Nebî Nûh dikin. Tên li vê mizgevtê dûa dikin û yên nexweş şîfa dibînin yên feqîr dewlemend dibin. Li gor baweriyekê gelê cizîrê pir dewlemende û ew dewlemendiya wan bi xêra Nêbî Nûh e. Behtir gelê herêmê têne ser tirba Nebî Nûh (Zeynep Göktaş, 29/01/2024).



**Wêne 3.** Tirba Nebî Nûh



**Wêne 4.** Mizgefta Nebî Nûh



**Wêne 5.** Mirovên li ser Tirba Nebî Nûh Dûa Dikin



**Wêne 6.** Tirba Nebî Nûh

### 3.6. Efsaneya Deviya Fadil û Şûşan

*Ev efsane ji aliyê Xesûwa min Halîsê Aslan ve hatiye gotin.*


Dibêjin zemanekî qiralek bi navê Abuzerd li gûndê fîlê li hemberê Hedilê hebû. Du zarokên wî yên cêwî çêbûbûn. Navê kurik Fadil navê keçikê Şûşan e. Keçik nexweş dikeve, gûrî dibe, kotî dibe. Li laşê wê çepelî çê dibe û dikeve nav nivînan de nikare der keve nav  hevalên xwe. Bavê wê jî çûye rêyeke dûr. Malbat jî pê pir diêşe.

Li gûndê hedilê di şikeftekê de hinek alim qûran ê dixwînin û ji xwe re îbadet dikin. Fadil jî ji nêçîrê di vegere malê di ber şikeftê re derbas dibe û dengên wan dike, diçe hundirê şikeftê de û silaf dike dibêje; "hun çi dikin?" ew jî dibêjin; "em qûrana pîroz dixwînin, ev qûran e, em jî misilmanin"  Fadil jî şaş dimîne dibêje; "xwîşkeke min heye, pir xweşike lê nexweş ketiye laşê wê çepelî jê çêdibe, gûrî bûye, kû hun xwîşka min karibin sax bikin ez û xwîşka xwe emê êne ser dînê we" ew alim jî dûa ji xwedayê xwe dixwazê û lingê xwe li erdê dixwe û dibêje "bi îzna xwedê" bi gotine wî re ev ji binê erdê der dikeve. Dibêje Fadil "vê avê bibe xwîşka xwe pê bişo bi îzna xwedê wê şîfa bibîne"

Fadil xwîşka xwe bi wê avê dişo û roj bi roj şîfa dibîne. Sax dibe. Şûşan û Fadil diçin şikeftê û kelîma şehdetê tînin her dû jî misilman dibin. Ji ber zilma bavê xwe ji kesekî re nabêjin bi dizî diçin qûranê hîn dibin. Nimêj dikin. Rojekê hinek dibînin seba Fadil û Şûşan ji bavên wan re dikin. Bavê wan Abûzerd hêr dibe û bi hers erîşî ser wan şikaften û misilmanan dike. Yên digêje wan sarê wan jê dike şûşan ji tirsa bavê xwe diçe serê lateke bilin dibêje " xwedayê min ev lat bi qelişe ez bikevim nava wê de" bi izna xwedê lat diqelişe, şûşan xwe dike nava latê de xwe diveşêre. Hên lat lê ne hatî hev xûlamên Abûzerd wê dibînin û wê şehid dikin xwîna wê li wir dirijê. Dareke berûwa li ser di çiqila di şûna xwîna Şûşanê de çê dibe.

Hinek xûlamên Abûzerd dikevine pey Fadil de fadil li bakûr û rojavayê Hedile digirin û şûr diavêjin Fadil fadil destê xwe dide ber xwe her dû destên fadil jê dikin. Xwîna wî li wir dirije. Xwîn dipijiqe li şûna xwîna wî jî deviyek çê dibe. Hinek dibêjin çil û yek darin hinek dibêjin sed darin hemî mîna hevin. Ne yek dirêjtire ne yek kintire ne pelê yekê behtirin ne jî kêmtirin. Hemî biqasî hevin û wek hevin. Navê wê devîyê hên jî gelên herêmê dibêjin "Deviya Fadil" . Tê bawer kirin kû ew ava di şikeftê de derketî hên jî nxweşîyên laşê mirovan sax dike. Yên kû xwerh bi wan ketî an jî kotî

bûn an jî gûrî bûn tên xwe bi vê avê dişûn û şîfa dibînin (Halise Aslan, Hezex Gundê Hedil, 30/01/2024).[3]

| | |
|---|---|
| <br>**Wêne 7.** Tê Bawerkirin kû Ev Dar Keziyên Şûşanê ne. | <br>**Wêne 8.** Tê Bawerkirin kû Xwîna Fadil Bûye Ev Devî. |

### 3.7. Efsaneya Dêra Mor Basûs

*Ji aliyê Rahîp Fadî Govergîs ve hatiye gotin û li ser rûpelê Dengê Torê TV* bi vê *lînkê ve hatiye parvekirin* https://www.youtube.com/watch?v=q5DJrHNlfF0

Navê Hedil gotineke bi zimanê asûrîyane tê wateya “xweda yeke, û yên wek wî nînin” eslê vê gotine “Hed-dil” yanî “yek xweda” ye. Dera Mor Basus li bakûrê gûndê Hedilê ye. Ev dêr piştî zayîna Nebî Îsa(kurtasî P.Z) sala 388 an de hatiye avakirin. Efsaneyek pir balkêşe. P.Z. 360-364 an de Persan bi hêzeke mezin erîşî ser Hêza Romayê kir. Şer qezenc kirin. Ji Nisêbînê, Kerboran, Hezex û heta bi Xerzanê kete destê Persan de. Piştî kû ev herêm kete destê persan de birayê qiral bi navê Abûzerd li gûndê Fîlê li hemberê Hedîlê rûnişt û keliha xwe li wir ava kir. Li wir du zarokên Abûzerd çêbûne navê kûrik Basus navê keçikê jî kirine Şûşan. Abûzerd ev zarok danine ber destê Rahîbekî Xrîstiyan da kû hînî xwendin û nivîsandine bibin. Navê rahip Stêfanos e. Abûzerd jî ji bona heca pûtperesta çûye Pers’ê dakû agir bihebîne. Nih mihan neve-

[3] Ev varyant ji aliyê misilmanan ve tê gotin û bawerkirin.

geriyaye Gûndê Fîlê. Di wê deme de Rahîp Stêfanos ev zarok li gorî baweriya xrîstiyana hîn kirine û zarokan dînê xrîstiyana pejirandiye. Di newala Hestpistê de di şikeftekê de Rahîp Lûngîno heye bîst û heft salin di vê şkeftê de ketiye înzivayê de. Rahîp Stêfanos van zorakan di vê şikeftê de li ber destê Rahîp Lungîno vaftîz dike.

Bavê zarokan piştî nih mihan ji Persê vedigerê gûndê Fîlê. Gelek bêriya zarokên xwe kiriye û zarokên xwe bi hesret himbêz dike. Dema cêjna pûta ya pêrsan tê. Dibêje zarokên xwe te em biçin ji pûtên xwe re îbadet bikin. Zarok biya bavê xwe nekin û naçine îbadeta pûta nakin. Abûzerd li ser vê nakokiye lêkolîn dike. Dema kû fêm dike kû zarok bûne xrîstiyan gelekî bihêrs dibe bi kîn di raje şûrê xwe û erîşî ser zarokan dike. Zarok bazdidine şikafte newala hespistê ya kû Rahîp Lûngîno û rahîp Stefaon tê de. Abûzerd dikeve pey wan de û rahîban bi hêrsa xwe perçe perçe dike wa xebatkarên dêrê û Rahîp Lûngîno û Rahîp Stêfano şehîd dike. Piştî wan re dikeve pey zarokên xwe de Mor Şûşanê di newala hespistê de li ser latekê digirê û şehîd dike xwîna wê li wir dirijê li wir dibe dareke diçiqil a berûwan. Mor Basûs jî bazdide bialiyê Hedilê de. Li bakûrê hedîlê ew devera kû jêre dibêjin dêra Mor Basus li wir zarok îca zane kû xelasiya wî ji destê bavê wî tûneye rûdine û destê xwe hildide û dûa dike. Bavê wî digihêjiye û hên destê wî li jor her dû destên wî jê dike û wî jî li wir şehîd dike. Ji ber vê yekê navê vê dêrê ji wê rojê û bi vir de bûye Dêra Mor Basûs. Her sal gelek xrîstiyan têne ziyareta vê dêrê û li vir dûa dikin. Ev bûyer roja înê 11 Gûlana sala P.Z. di 379 da de çêbûye. Gelek caran ev dêr hatiye restore kirin. Cara dawî di sala 2011 dan de hatiye restorekirin.[4]

[4] Ev varyant ji aliyê xristîyanan ve tê gotin û bawerkirin.



**Wêne 9.** Dêra Mor Basûs li Bakûrê Gundê Hedilê Berî Restorasyonê



**Wêne 10.** Dêra Mor Basûs Piştî Restorasyonê

### 3.8. Efsaneya Feqiyê Teyran û Tûma

Feqeyek hebû navê wî Feqe Mihemedê Ertûşî bû û bi eslê xwe ji Mako bû. Rojekê ji ber feqetiyê tê kû were Cizîre. Yekî file bi navê Tûma kû şal û şapik çê dikirin çû xwe li kir feqe da got lazimeya, misilmanan bavê min kuşt, seet çarê rojê hebû, nan û dawê şûrtên li ber bû go mi nego li vê xisaretê û tê çê cizîrê û lazime tu min bi xwe re bibe. (Wê çaxê mîrê bota li cizîrê bû. Bin siltanan re mîr hebûn.) Tu min bi xwere bibe cizîrê. Go ez nikarim te bi xwere bibim. Tû zilamekî fileyî tû misilman

nabe ez feqeyê misilmana me. Go na wele bi xwedê tu min bi xwere nebe ezê roja qiyametê di mahkama kûfra de ez dawedarê te me. Vêce pê ket û hat malûme ji serhedê heta tê cizîrê eşîr eşîrîn. Gewdan e, Spîn e, Spêrtîn e, Dudêran e, Mamxweran e, Kiçan e û her eşîrê mezinin. Û di nav wan re tên. Têne digihine mala mûxtêr. Mûxtar dibêjiyê de dibê “feqe mihemed tu bi xêr hatî, keremke here banî, mêvanê me hene, va min heywaneke we serjê kiriye û ezê fiavîna we hazirkim.” Bi berstika tûma digirê nahêle here. Qederek tê ve çû feqe dî kû filihê wî nehat. Vegera hat gota mûxtar “hey mûxtarê ser serî, te çima filihê min hişte li ber derî?” go “feqe mihemed bela xwe ji tûma veke, welleh tûma xayina û zilamekî fileye, min navê bi te re were, vêce ji tûma re bêje bi soz ezê sed zilamê bi tiving dimê de ezê wî bime cihê wî, hema kû bi te re tê li zora min diçe, tu feqeye û ew fileye” go “heyra ma min tûma ne hilgirtiye, ew bi lingê xwe tê ez bi lingê xwe têm, ma mesela bavê meyî îbrahîm xelîl te nebihîstiye, vêce wextê go yê cihû hat û lê bû mêvan û wî go ez te nahawînim û yê cihû bazda û îbrahîm xelîl çû heta li pişta xwe kir û anî, vêce me li pişta xwe ne kiriye, bi xwedê ezê ji mala te çim” go “di bextê xwedê de ji mala min neçe” go “na te rîayet te qedr ji min re ne girt ezê çim” dibêje “bi soz min weke hespan hevsar bike, li vî kendalê ha kar bike, ezê rîayetê ji te re kim lê bila file ne bi te re be” “û ezê bi soz sed mêrê bi tivin dimê de heta here cizîrê” dibê “tûma lawo sed mêrê bi tiving ji tere ji min çêtire” go “ na wele heçî kû win misilmanin win bê ojdanin, wellehî wê min bine pişta van bestikê ha û wê min kujin li ser cilikê min” şal û şapik jî çê dikirin. Di zozana de herkesî nas dikir. Bellî bû şal û şapik, cil çê dikirin. Pêre hatiya, heta tê nêzîkê cizîrê, gelî li cizîrya ye. Vêce got yê de go “tûma deh metra nêzîkî min ne be, welleh tû nezîkî min bibe ezê malîkê li te xira bikim” go “na ezbenî welleh ez ji deh metra û pêve ez nagihime te” teyrîk, heywanet pêre di şitexilîn, feqî ciwaba wa dida. Hatine geliyê cizîrê, Qesirka Gêlî. Tu teyrika bakirê hevdû go “ ewqas te’b û ewqas kêferat û Feqe Mihemed bi Tûma re dît û Tûma lê xayina”

Gotiyê go “Feqe Mihemed” go “ez di bextê te û xwedê de vîqasî ez îşê te ne şitexilî bûm, hema ya va teyrika çi gote de, di dilê min de ma, tu vê tenê ji min re bêje”

Go “Tûma min gote te nêzîkî min nebe û qarişî îşê min nebe, welleh van teyrika ji min re got go em ber Feqe Mihemed dikevin, ewqas te’b û ji zozana bi xwe re anî û di nav waqas eşîran re û waqas dera re û meyzêne bixwedê Tûma yê lê xayin be”

Go “ pek û li vê ecêbê, welleh roja qiyametê ez da’wedarê van teyrika me, ewqas kêferat û ta’b te bi min re dît ma ezî çilo bi te xayin bim”

Feqe gotiyê de go “ bi xwedê gotina teyra bê şubheye, ji xanibê qelbê meye, heta roja bi ser me bê” hevdû anine gihana cizîrê, gihana birca belek, go “Tûma ez Feqeme ezê çime camiyê, tu nayê camiyê, aha vêce were ezê te bim teslîmî bircê kim û ezê çime camiyê tê çê cem mîrê xwe” go “bila bê” kete hindirû yê bircê de. feqe vegeriha camiyê. Û tûma çû go du sê pîrekê li wê dê dolmika û wana di hîşênin.

E go “ ka siltanê vê bircê, ka mîrê vê bircê?”

Go “mala te xira bû, ma tu di gûhê gêdeyî, ma tuştek ne bihîstiye?”

Go “na welle, xêre?”

Go “di bê li vî çemê westaniyê xizenekke zêra heye, çil barê deviha ye, bi xwedê mîr xizîna xwe jî xilas kir, sîxorta serê wî avetiye, aqilê xwe winda kiriye, konê xwe li wî çemê wesaniyê vedayê, wellehî ji qehra nayê malê, jêr jî xilas bûn, pere jî xilas bûn, xizîna wî jî xilas bû û pere jî nedî tin”

Di bê “ bêjine mîr, here bêjine mîr bi xwedê min xizîne diye”

Go “te çilo xizîne diye?”

Di çin ilm didine mir. Mîr tê “ka xêre?”

Di bê “ mîrê min” di bê “ha” di bê “ mîrê min, wellehî feqe hat, bi min re hat, di misrê de jî alimê wilo nînin, heywanet, teyrik, çûk pêre di şitexilin, ciwaba wa dida”

Tûma kete ali.

“ka feqe?”

Go “bi xwedê ezê çime camiyê, çû”

Mîr cimîenê, (di bê sêsed û şêst û şeş cami wê tarîxê di cizîrê de hene) bi cimîenê cizîrê ket feqe nedit.

Tûm go “ Mîrê min,tu bi wilo dernaxe, qismê (heçî feqe û mela ne hij xwarina xweş dikin.) Mewlûdekê bide, û qismê mela û feqihê bêne ser û şêxa.”

Di bê mewlûdek çê kir û bakire qismê mela.

Go “qismê feqihê xwe bênin werine ser mewlûdê”

Çadir vedaye, tûma di çadirê de ye, çavê xwe li Feqe Mihemed di gerêne. Çiqas birrê tê.

Di bê “ lawo Tûma te ez hetikandim, te dî ne ne dît?”

Di bê “ha mîrê min bila mîr ber xwe nekeve, welleh ne di nav va de ye, emir bike, divê evna were, welleh tu vîna newêne xizîne çû, ma wexta tu dêw dikeyêne, kûp û kûp û kûp û kûp bi zorê, ma heta tu dew ne keyêne, tu wê te’bê pêre nebîne ma rûn pê dikeve? Heta tu birinc kûp û kûp û kûp û kûp  tu birinc ne kûtê, birinc xwe ji çoqê xwe di berde? Bila mîr ber xwe ne keve, emir bike, bê zû, careke dî jî werê, careke dî jî werênin ”

Careke dî jî hatin.

Di bê “ka te dît, te ne dît?”

Di bê “bi xwedê min ne dît.”

Di bê Birahîm û Tewfîq rakirin, û li cemîenê cizîrê qontrol kirin, di bê camîkek heye, camîkek biçûk heye, ji camiya sefîq rakirin. Anîn

Go “ feqe” go “ha” go “ yelle ka ev xizîne di kû derê de ye?”

Go “ya mîrê min, tu li şêxa meyzê, tu li mela meyzê, ez ji nûka ev du sê kitê be ez dixwînim. Ma ez ji zanim?” berda.

Go “ha mîrê min, mi zanî bû go wê te qandirmîşkê, ne bi teyra re di şitexilê, ne mi dî, aqilê te jê bir, welleh tu wî berdê te xizîne ne dît, werê ne”

Bi berstika wî girt. Go “em çi jê bikin?”

Go “bibe hepsê” welleh navê wî jî kire hepsê de. Kire hepsê de. Deh roja. Bîst roja. Her sê xwarina hepsiye timama weke zêwê di bir re ji wan re, qirka hepsî aha halo lê hat (yanî pir stûr bû, bi destê xwe nîşan de) ji bonî xatirê feqe. Feqe derxistin.

Go “feqe ka çiye?” go “ka bêje”

Go “ ya mîrê min ma ez feqirê xwedê, ma ez ji zanim di kû deye.”

Tûma go “ mîrê min heçî win misilmanin rehm di qelbê we de heye, bi hinek xwarinê didine, me’dê wî ji yên mi xweştire, tê vî kê tek hicrê de tê yekî filih kê ber de, tê yekî fileh kê berde, wê xetesiz bê” kirê hepsê de. Tek hicrê de. Yekî fileh kire berde. Yazdeh dozdeh roja ma çû li feqe meyza

Go “ezê bêjim”

Feqe derxistin go “feqe” go “çiye”

Go “ yelleh xizînê bêje”

Go “mîrê min bila ez bi ser xwe ve werim ezê bêjim”

Feqe xwedê kirin sê roja.

Go “mîrê min şertê vê hene.”

Go “ şertê wê çine?”

Go “sed devihî, sed gamêşî, sed çêlekî, sed bizinî, sed mihî, qismê heywana pê ket sede sed tê gûrêne, kevelkê û tê avêje vî Çemê Westaniyê”

Wî jî telîkeke xwe, kozikeke xwe kolaya xwe kiriye nava kelaşan de xwe veşartiye, cimîenê teyrê dinyayê hatinê de.

Go “ev ziyafêta hanê kê daye?”

Teyrikekê ji diya xwe pirsî

Go “ma ev ziyafeta ha kê daye?”

Go “keçam wele Feqe Mihemedê Ertûşî daye, reîsê me teyra ye, û mîr lê hatiye xezebê û dibêje xizîne di vî Çemê Westaniyê de heye, lazime tu hişkere bike. Aha ji bo xatirê me wellehî Feqe ev zêwa henakê ji mere daye ”

Go “ bi soza xwedê sibihê şeveqê go rojê da der ezê çim li ser devê xizînê hêk kim”

Ew jî zimanê heywaneta zanibû. Sibihî teyrikê çû li ser devê xizînê hêk kir.

Feqe go “mîrê min” go “çiye”

Go “de were” go “xêre?”

Go “aha va devê xizîna te ya di virde ye, lê heme şertê wê hene, ezê paleyan girim û kolim heta min derxistî.”

Di bêjin qismê feqihê Cizîrê û melayên Cizîrê û şêxê Cizîrê her yekê tevrek da test wa, qazmêkik. Go “winê vêdê kolin, roja we bi zêrekî” deh rojan, bîst rojan. Da ku feqe, mele û şêx ji xwere bidine bi kitêb û ew. Feqeyan lê da “terq” xizîne derket. Xizîne derket, go ilm bidine Tûma bê “vaye xizîne derket” go Gorgîn hebû, kûrê mîrê botan bû. Go “Gorgîn” go “çiye?” go “ here bake Tûma bila were”

Tûma hat, keyfa wî hat, go “wele wê rutbekke baş dê mi.” Go “Êzdîn” go “ha” go “ma bavê te û kî ne, kî li wire, kî li ser devê xizînê ye?”

Go “wele bavê min û Feqe Mihemed in” aha, kezeb lê qetihan, go “bi xwedê filta min jê nîne”

Bankiriyê go “Tûma!” go “ha!” go “ka were were pêzeweng! Te ev ecêb aniye serê Feqe”

“mîrê min mi xizîne ji te re dît”

“na, pêzeweng da qene careke dî ti filihên dî weke te li qarşê Feqihê me misilmana nawin”

Şûrêk avête serê wî jê kir. Feqe goti yê “ Mîrê min tû xweyê wî nînin. Ji zozana ye. Xweyê wî ezim bi min re hatiye. Sibihê zarok û pîreka wî wê êne cem min wê ûzûlmîşbin. Ez bêjim “ ka welleh fileh mir û ez hevalê wî bûm û ez lê xweyî dernekevim” “tê serê vî Tûmayî tê ji min re li ber zêra kişêne”

Serê Tûma avête mêzînê ne rabû. Di beroşê bi çêmbil anin yek serê kirinê ya dî jî tije zêr kirin. Serê wî ne rabû.

Go “mîrê min tu vaqqa zêra li ber serê wî bikişêne na rabe”

Go “ ça’vê wî û devê wî” go “ne ji xweliyê têr bibe, têr nabe”

Kûlmek xwelî avête ça’vê wî û devê wî de û kûlmek zêr li ber hat.

Go “bi xwedê min ev zêr jî ne dibirin, lê pîreka wî wê ê sibihî û ev xwîniya wî ye ezê bêjim -kesekî wî li wa dera nebû ma ne xweyê wî ez bûm bi xwedê hineka kuşt

sorineke wî û hineka çê bû hineka kuşt mi xwîna wî stand aha va ev pere ev zêrê hanakê xwîna zila mê te ne-“

“Eva ti îşê min nema ezê rabim çim.”

Feqe çû Qesirka Gêlî li ser Cizîrê re ye. Li çem rast bû. Nal nala çêm jî gelekî mezine. Gelek dihat.

Bakiriyê de go “ ya çemo ne perê te heye, ne zimanê te heye, ne lingê te heye, ne destê te heye ev qir qir û ev bir bir û ev nal nala te ji kû tê? Ka ji min re bêje”

Go “ sêwîyê çepelê pîsê heram, ji hinga xwedê dinya ava kiri ve ne ji eshabiya ne ji pêxembera û ne ji kesekî ev sûala he ji min nekiriye, de seyra min û vî Feqihkê pîsik kin”

Go di bê “ ma tu ji kû ve tê, tê bi kûve çê, ev çi qir qire ji nava te tê?”

Go bi xwedê “ ez na hêlim tu here”

Lingekî xwe avête vî rexê çêm lingekî dî avê te rexê dî. Av lê bû kom. Carekê da erdê cara dîtirkê rabû. Go “ya bi izna xwedê” kir û ne kir hew karîbû here. Av bi hewa ket û av bi hewa ket di bê av çû bakire xwedê.

Go “va Feqiheke, li serê mi bûye musellet, miserrit bûye, na hêle ez herim, ev înkara emrê te dike”

Go “welleh heçî Feqeye, timî daîm dil bikule, ji boyî min ça’vê wî şile, ça’vê wî li ser min dişewitin, wellehî go ew çi ji te bike min izna wî day”

Go “ne Feqihe” go “ xwe bi koteka kiriye Feqih”

Go “Feqe çi ji te bike esil ew e”

Avê go “ di bextê xwedê de, li dora Bexdayê masî ma ne bej, masî ji têna qelihan, Feqe destûra min bide min nizanî bû tu Feqihekî halo mişûrî, bi xwedê tu ser nebiya re yî”

Go “na na here şikayeta min li cem xwedê bike, bê ne Feqihe, inkara emrê te dike, ez bi zorê sekinandi me, na ez îro destûra te nadim, divê tu tobe bike go ne hisa te were, ne dengê te were, ne qir qir were, bê his divê tu here, tu nahêle xelk raze”

Go “destûra min bide” go “ ez herim, bi soza xwedê” go “îdî his ji min newe”

Di bê “na”

Vêce av gelekî çê bû û da serê gelî di bê teyr li ser hêlînê xwer firîn. Giha da serê çiqilê dara.

Di bê “na, tu tobe neke û ez halo te berdim tê gûnda û bajara li ber xwe bê lazime tu tobe bike û tê di nav piyê min re derbas bibe heta tu were sêhra xwe”

Di bê weke werîsê şixrê lê kiriye û zirav kiriye û di nav paqê wî re derbas bûwe ji wê rojê heta îro ew nehîtê çema his jê nayê tu diçê cem jî deng tê de nîna. Wilo Çemê Cizîrê di herike.

Aha niha vêce tirba wî li Miksê ye. Ya Feqihê Teyra.

(Mehmet Emin KAVAK, 66 salî, ji Gûndê Xirabê Sosina/Hezex/Şirnex, 23.04.2023, ev efsane ji mezinê xwe guhdarî kiriye û weke li bîra wî maye gotiye, Têkilî: 05327676250).[5]

### 3.9. Efsaneya Devgirêdana Gûran

Min bixwe di biçûktayiya xwe de şivantî dikir. Carinan sewal an dewarên me di mane şeveder. Dema dimane şeveder bavê min benikek tanî mîna benikê şekala an jî tayê stûr kû em jêre dibêjin nex dianî û sûretê şems kû di Qûrana Pîroz de sûretê 91. Ji panzdeh ayetan pêk tê dixwend û her ayeteke dixwend grîştonekek diaveta wî nexî heta xilas dikir panzdeh grîştonek çêdibûn. Piştre dûa dikir digot “ya Rebî tû devê dehbên çolê li filan heywana me bigire” û ew benik bi devê dêrî ve didaleqand heta sibehî. Gelek caran me ew heywanên dimane şeveder bi selametî digihiştin malê. Piştî ku me heywanên xwe yên mane şeveder ku me di dîtin me careke din ew benik dianî û dîsa sûretê şems dixwend û her ayeteke me dixwend me benikek vedikir. Bavê min digot heger em vî benikî venekîn heye kû ew heywan ji nêza bimirin. Gava benik vedikir dîsa digot “ya rebî filan heywamana me bi silametî gihişte malê, seddeq ji navê

[5] Min ev efsane ji Ata Akın girt û min bixwe deşifrasyona wê çê kir. Ev efsane di vîdeoyê de hatiye gotin û çawa gotiye min wisa nivîsandiye, tu rastkirin/destkarî lê nehatiye çêkirin.

te re, tû wan heywanên berî devî wan veke kû li ser risqên xwe herin" piştî ez hîn bûm min jî gelek caran ev rîtûel çêkir (Hakim Bağı, 30/01/2024).


### 3.10. Efsaneya Mor Dodo

*Ev efsanê ji aliyê Îhsaq Atak ve hetê gotin. Îshaq Atak sala 1980an de li gûndê Basibrînê hatiyê dinê. Îshak karê hingiv û cotkarîyê dike.*

Navê Mor Dodo yên rastî Dawîd e. Li gûndê Sîdûsê li nêzî navçêya Melazgirtê girêdayî Bajarê Mûşê ye. P.Z. di sala 529 an de hatiye dinê. Navê bavê wî Şemûn navê dîya wî Helenî ye. Ev gelên sûryanî ne. Xwendina xwe li gûndê xwe û derdora gûndê xwe temam kiriye. Malbata wî pir dewlemend bû. Malbata wî xwestin bi zewicînin lê wî jiyana xwe ji bona xwedê li ser rêya xwed bexşand. Ne zewicî. Piştî diya wî û bavê wî wefat kirin wî dev ji hemî mal û milkên xwe berda mal û milkê xwe di riya xwedê da feqira û ew bû rahîp û çû tebrîzê li wir manastireke pir mezin heye û rahibekî bi navî dawid li wir jî heye çû bal wî xwendina hen jî pêşde hist. Li tebrîzê li ber destê dawid ê navsêr nezê 5-6 salan maye û mamosteyî wefat kiriye ew jî ji menastire diçe çiyayekî li hemberê wê manastirê dikeve înzivayê de nêzî donzdeh salan li wir bi tenê ji xwe re îbadet dike. Piştre Ser Rahîbê wê menastire di xewna xwe de Mor Dawid dibîne. Yêkî navser di xewna wî de pirsa Mor Dawid dike. Dibêje " yekî bi navê Dawid li vir di ma, çû bi kûve? Çawa hûn lê na pirsin? Ew li vî çîyayên hember di înzivayê deye herin bînin" ew jî dibêje "ez nizanim" roja dî rahîban tev lihev dide hev ji wan dipirse " ew rahîbe ji Sîdûsê hatî li kûye, bi kûve çûye?" kesek ji wan nizane. Ew jî bawer dike kû xewna wî raste û diçin wî li çiyê dibînin carek din tênin menastire. Piştî dozdeh salan kû tê menastire ew rahîbên din gelek jê re hûrmet digirin ew jî vê teweccûha rahîban rehetsiz dibe û diçe Qûdsê, ji Qûdsê diçe Misre. Ji wir jî vedigere kû carek din vegere tebrîze lê bi rêde fikra xwe digûhere û berê xwe dide newala Hespist li wê newalê di şikefteke piçûk de dîsa dikeve înzivayê de. Li wir şivan wî dibînin û tên ji gûndiyan re dibêjin. Gûndî diçin dibînin kû mirovekî bêzerare û serê xwe jê naeşînin. Piştre navê wî li wî cihî belav dibe mirov nexweşên xwe dibin bal wî yên kor, yên gûrî, yên kotî û bicûzzam dibirin bal wî û şîfa di dîtin. Lê çûnû hatina wê şikeftê pir zehmet bû ji ber vê yekê gûndiyan ew birin gûndê Hespistê û ji wî re Dêrek bi navê Mor Dodo avakiri. (navî wî Dawid bû lê çima digotin Dodo? Dema Dêr ava

kirin marekî reşî mezin ji nav keviran derket û bi du xebatkarên dêrê ve da û ew jî kûştin. Wî jî xwe berpirsay dît û ji ber vê yekê go navê Dawid pir mezine ez ne layiqê navê Dawid im û bila ji vir û pê de navê min Dodo bê. Wateya dodo kûrmê biçûke. Ji wir û pê de navê wî bûye Dodo. ) Dêma hate gûndê Hespist temenê wî 40 sal bû. Bîst salî dî jî li wir jiyana xwe ber dewam kir. Temenê wî gihişte şêst salî. Piştre Metranê Tikrîtê wefat kiribû gelê Tikrîte qasid şiyandine patrîke Antaqya û xwestin Metranekî din ji wan re bişîne. Petrîkê Antaqya Mor Petrûs dûa ji xwedê xwest kû yekî layiqê Metrantiya Tîkrîtê bibîne. Wî jî di xewna xwe da dît û jê re hate gotin kû yekî layiqê Metrantiya Tîkrîtê li Bedzebdayê(Hezex) li gûnde Hespistê yekî bi navê Dodo heye û layiqê Metrantiya Tikrîtê ye.


Piştre Mor Dodo li Tirkîtê bi wazîfa Metrantiyê wazîfedar kirin. Li Tikrîtê 20 salan wazîfa Metrantî kiriye. Li wir wefat kiriye. Mor dodo sala P.Z. 609 an li Tikrîtê wefat kir. Dema li wir Metrantî dikir kurhalî wî bi navê Îshaq li ber destê wî rahîp bû. Piştî kû mirina wî 18 sal derbas bûn Îshaq di xewna xwe da dît Mor Dodo Jêre got “Cenazê min ji vir bibe Tor Abidîn.” Cenazê wî anîne herêma Tor Abîdîn gûndê Hespistê Dêra Mor Dodo. Li wir cenazê wî du salan maye. Careke din hatiye xewna rahîbên hespistê û ji wan re jî gotiye “Evder wê ji destê xirîstiyana derkeve û min ji vir bibine ciyekî kû tucaran ji destê Xristiyanan dernekeve” rahîp wî ji wir tînin gûndê Basibrînê. Li wir du mûcize çê dibin. Cara yekem diz eriş dikin kû tiştina ji cenazê wî bidizin ji wan weye kû zêr di vê sandoqê de heye. Dema têne diziyê kor dibin. Vedigerin çavên wa vedibe. Piştî vê mûcîzê pirs dikin û fêm dikin kû ew cenazê Mor Dodo ye ew jî tobe dikin dibin rahîp. Mûcîzeya dûyem; dema cenazê Mor Dodo tê gûnd li gûn cenazeyek din heye. Ew cenazê kûrê mezine Basibrîne ye. Kûrekî wî tenê heye ew jî miriye ew kirine tabûtê û dibin kû veşêrin. Dema cenazê Moro Dodo tê bavê kûr dibêje hîvî ji xwedê qût nabin hema vê sandoqa Mor Dodo danin ser tabûta kûrê min hevî dikim kû sax bibe. Bi hev re dûa dikin û dibînin kû kûrê wî ji mirin sax dibe. Dibêjin ev meyit gelekî bi qîmete û em wî ji vir naşînin tû deverê din. Tirba wî li gûndê Basibrînê çê dikin û li ser tirba wî jî Dêra bi navê Mordodo carek din ava dikin. Ji wê rojê heya vir yên kû baweriya xwe pê tînin têne ser tirba Mor Dodo û jê dûa dixwazin û şîfa dibînin ji nxweşiyen xwe sax dibin (İshak Atak, Basibrîn, 31/02024).




**Wêne 11.** Ji Pirtûka Dawit Er Dîroka Basibrînê Beşa Mor Dodo




**Wêne 12.** Dêra Mor Dodo




**Wêne 13.** Dêra Mor Dodo




**Wêne 14.** Dêra Mor Dodo

# ENCAM

Di vê xebatê da me ji herêma Hezexê xisûsen li çar gundên weku Babek, Rîzok, Hedil û Basibrînê berhevkarî kir. Di encama berhevkariyê da me 10 efsane kom kirin û me efsaneyeke gerok jî ji Xirabê Sosina da hev û bi vî rengî tev da di xebata me da 11 efsane kom bûn.

Efsaneyên me nerhevkirî bi piranî li ser kesayet û cihên pîroz bûn. Ev yek jî nîşanî me dide xelkê vê herêmê bi kesayet û cihên pîroz gelek bawerî tînin.

Di nav efsaneyên me da hin efsane him li cem Kurdan him jî li cem Siryanan hevpar tê gotin. Bo nimûne efsaneya Mor Dodo û efsaneya Dêra Mor Basûs ji van efsaneyan in. Herçiqas bêtir li ser bawerîya Siryaniyan ev efsane ava bubin jî ji, aliyê Kurdan ve jî pê tê bawerkirin. Çimkî ew xisûsîyetên efsaneyan di van vegêranan da xuya ne. Herwiha ji bo ku ev her du millet di gel hev, din av hev da jiyane, bûne şahidê bûyer û kesayetên hev ên dersiruştî. Loma jî vê yekê lê kiriye ku efsane bibin malê hevpar ê her du milletan.

Hin efsaneyên me gerok in di navbera gelek welat û deveran da tên gotin weku efsaneya Feqiyê Teyran û Tûma û hin ji wan jî bi deverê re eleqedar in weku efsaneya Girê Êlim. Esil efsaneyên me yên mehellî ne tene li gundekî, li çend gundên derdor bi hev re tên gotin.

Ji aliyê berhevkarîyê ve jî bêtir me bere xwe da nifşa kal û pîran. Çimkî kifş bû ku êdî din av nifşa ciwan da ev efsane zede nayên gotin û belav nebûne.

# ÇAVKANÎ


Bascom, William R. (2006). “Folklorun Biçimleri: Nesir Anlatılar”, (Çev.) R. Nur Aktaş ve diğerleri, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 113-132.

Buch, Wilfried. (2006). “Masal ve Efsane Üzerine”, (Çev.) Ali Osman Öztürk, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 223-228.

Keskin, Necat. (2019). *Folklor û Edebîyata Gelêrî*. Stenbol: Weşanên Avesta.

Pentikainen, Juha. (2006). “Efsanenin Yapısı ve Fonksîyonu”, (Çev.) İsmail Görkem, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 113-132.

Sakaoğlu, Sakaoğlu. (1980). *Anadolu-Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu*. Ankara: Ankara Üniversitesi Basımevi.

Subaşı, Kenan. (2022). “Pirnavîya Cureyên Vegêranên Gelêrî û Nestandartbûna Wan di Kurdî de”, *Folkilorê Kurdî*. Bergê Duyê, 527-550. Zakho: Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî.


## ÇAVKANÎYÊN DÎJÎTAL


Dengê Torê TV. (2024). “Şırnak İdil Kaya Köyü Kilisa Tarihi. Ola Süryani Dera Beranî Lı Gundê Hezexê Hedıle” (Erişim 31.01.2024) https://www.youtube.com/watch?v=q5DJrHNlfF0


## ÇAVKANÎYÊN DEVKÎ

1.

Nav Paşnav: Abdullah ÇİN

Temen: 1963- (61 salî)

Perwerde: Dibistana Seretayî

Navnîşan: Gûndê Rîzok Hezex/Şernex

Dîroka Hevpeyvînê: 28/01/2024

Ev efsane/agahî ji mezinê xwe guhdarî kiriye: ji mezinê xwe Apê Yehya hîn bûye.

Têkilî/Telefon: 5416968307-5454836217

2.

Nav Paşnav: Abdulkerim BAĞI

Temen: 1947-(77 salî)

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gûndê Rîzokê Hezex/Şernex

Dîroka Hevpeyvînê: 28/01/2024

Ev efsane/agahî ji mezinê xwe guhdarî kiriye: pêşiyên wî, Yehyayê Himed, Mehmedê Hêcî, Resûlê Hecî

Têkilî/Telefon:5418397501-5434661058

3.

Nav Paşnav: Galip ASLAN

Temen: 59

Perwerde: Dibistana Seretayî

Navnîşan: Gûndê Hedîlê Hezex/Şernex

Dîroka Hevpeyvînê: 02/02/2024

Ev efsane/agahî ji mezinê xwe guhdarî kiriye: ji pêşiyên xwe hîn bûye, Birahîmê Têhir, wî bixwe lêkolîn kiriye.

Têkilî/Telefon:+491713134274

4.

Nav Paşnav: İshak ATAK

Temen: 44

Perwerde: Dibistana Navîn

Navnîşan: Gûndê Basibrînê Hezex/Şernex

Dîroka Hevpeyvînê:

Ev efsane/agahî ji mezinê xwe guhdarî kiriye: ji Kalê Xwe Murat Atak hîn bûye.

Têkilî/Telefon: 5375044654

5.

Nav Paşnav: Zeynep GÖKTAŞ

Temen: 57

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gûndê Zengilok Hezex/ Şernex

Dîroka Hevpeyvînê:29/01/2024

Ev efsane ji mezinê xwe guhdarî kiriye: Ji pêşiyên xwe hîn buye. Ezedînê Ebo Muxtarê Gûnd bû.

Têkilî/Telefon:5412141430

6.

Nav Paşnav: Mehmet Emîn KAVAK

Temen: 66

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gundê Xirabê Sosina/Hezex/Şirnex

Dîroka Hevpeyvînê: 23.04.2023

Ev efsane ji mezinê xwe guhdarî kiriye.

Têkilî/Telefon: 05327676350

7.

Nav Paşnav: Halise ASLAN

Temen: 60

Perwerde: Nexwendî

Navnîşan: Gûndê Hedîle Hezex/Şernex

Dîroka Hevpeyvînê:30/01/2024

Ev efsane ji mezinê xwe guhdarî kiriye: Xezûrê xwe. Îbrahîmê Têhir.

Têkilî/Telefon:5438170998